Informationsverbund
ASYL & MIGRATION

Die Anhörung im Asylverfahren – kurdische Fassung (Kurmandschi)

Di pêvajoya penaberiyê de îfade

Agahiyên ji bo kesên li Almanyayê daxwaza mafê penaberiyê dikin

Çapa 4. Kanûna Pêşî 2016

Hûn vê Agahnameyê ji

werdigrin.

In Kooperation mit UNHCR

Ev agahname dikare di malpera **www.asyl.net** (di bin sermijara "Arbeitshilfen/Publikationen") jî bê dîtin.

Impressum:
Die Anhörung im Asylverfahren, Hinweise für Asylsuchende in Deutschland.
4. Auflage, Dezember 2016

Herausgeber und ©: Informationsverbund Asyl und Migration e. V., Haus der Demokratie und Menschenrechte, Greifswalder Str. 4, 10405 Berlin, kontakt@asyl.net

Die erste Auflage wurde erstellt in Zusammenarbeit mit dem Info-Bus für Flüchtlinge, München.
V. i. S. d. P.: Michael Kalkmann, c/o Informationsverbund Asyl und Migration
Unveränderte und vollständige Vervielfältigung und Weitergabe ist gestattet.

Die Inhalte des Merkblatts sowie die Übersetzungen wurden mit größtmöglicher Sorgfalt erstellt. Eine Haftung für inhaltliche Richtigkeit, Vollständigkeit und Aktualität der Informationen bzw. der Übersetzungen sowie für Schäden, die aus der Verwendung der Informationen bzw. der Übersetzungen entstehen, kann nicht übernommen werden. Rückmeldungen zur Qualität oder Aktualität der Informationen bzw. Übersetzungen richten Sie bitte an den Informationsverbund Asyl und Migration.

Die Erstellung und die Übersetzungen der 4. Auflage 2016 erfolgten im Rahmen des Programms „Koordinierung, Qualifizierung und Förderung der ehrenamtlichen Unterstützung von Flüchtlingen". Das Programm und diese Publikation wurden gefördert durch die Beauftragte der Bundesregierung für Migration, Flüchtlinge und Integration.

Weitere Informationen zum Programm unter:

fluechtlingshelfer.info

Informationen für Flüchtlingshelferinnen und -helfer

Gefördert durch:

Die Beauftragte der Bundesregierung für Migration, Flüchtlinge und Integration

Wir sind's!
Die Einwanderungsgesellschaft gestalten

Derbarê vê agahnameyê de

Em dixwazin bi vê agahnameyê hin agahiyan di derheqê îfadeyê, ya di pêvajoya penaberiyê de bidine we. Îfade, girîngtirîn derfet e ku hûn bikaribin sedemên derketina ji welatê xwe ragihînin. Îfade dikare diyarker (taînker) be, bê hûn dê li Almanyayê bêne parastin. Jiber vê yekê divê hûn xwe ji bo îfadeyê baş amade bikin.

A baş ev e ku hûn beriya îfadeyê biçin gel **parêzgerekî an parêzgerekê**, an jî biçin **nivîsgeheke** (buroyeke) **şêwirmendiyê** ya ji bo penaberan. Li Almanyayê gelek sazî û dezgehên serbixwe ku bêpere şêwirmendiya penaberan dikin, hene. Dibe ku we agahiyên derheqê nivîsgehên şêwirmendiyê, hêj dema serlêdana penaberiyê kiribe, wergirtibin. Ku we ev agahî wernegirtibin, ji karmendên sosyal (Sozialarbeiter) ên wargeha (Wohnheim) xwe bipirsin. Hûn dikarin navnîşanên nivîsgehên şêwirmendiyê di înternetê de ji malpera www.asyl.net û di bin sermijara »Adresen« jî peyda bikin.

Serlêdana mafê penaberiyê çi ye?



Hûn serlêdana xwe li gel Daireya Karûbarên Koçberî û Penaberan **(Bundesamt für Migration und Flüchtlinge – BAMF –)** dikin. Eger hûn li gel daîreyên dinê yên fermî (weke li gel Polîs) daxwaz penabriyê bikin, ew dê we ji wê bişînin BAMF-ê. Paşê dê biryar bête dayîn, bê kîjan BAMF ji bo serlêdana we berpirs e. Dibe ku ew BAMFa divê hûn biçinê, li bajarê we be. Eger BAMFa pêwîst e hûn biçinê, li devereke din ya Almanyayê be, divê hûn biçin wê. Girîng e ku hûn beyî biderengî bikevin, xwe teslîmî nivîsgeha BAMFa ji bo we berpirs e, bikin. Heke na, ev yek dê di pêvajoya penaberiyê de zirarên giran bide we.

Mixabin dibe ku qeyda serlêdana we ya penaberiyê ji aliyê nivîsgeha BAMFê yekser çênebe. Di rewşeke weha de divê teqez ji bo we belgeyeke weke nasname tê qebûlkirin û bi gotina: »**Ankunftsnachweis**« destnîşankirî, bê amadekirin. Ku qeyda serlêdana we piştî çend hefteyan jî çênebûbe, divê hûn serî li nivîsgeheke şêwirmendiyê bidin.

Eger hûn serlî -li mafê penaberiyê- bidin, dê wêneyên (sûret) we bêne kişandin û şopa (şûn) tiliyên we bêne wergirtin. Dibe li gel hin pirsên dinê, pirsên derheq we de, derheq cîhê îqameta we ya dawî ya dewleta hûn jê hatine, derheq dê û bavê we, derheq bapîr û dapîrên we, derheq rêya hûn pê gihaştine Almanyayê, bêne pirsîn. Lêbelê dibe ku ev pirs di çarçoveya îfadeya we de jî ji we bêne pirsîn. Lê Pêvajo li herderê weke hev nameşe.

Dema serlêdana we kete bin qeydê, ango qeyda we hat çêkirin, hûn dê belgeyeke bi gotina »**Aufenthaltsgestattung**« destnîşankirî, werbigrin. Ev belge di dewsa nasnameyê de ye û divê her bi we re be.



Girîng: Nameyên ji BAMF-ê

- Eger nameyên ji BAMF-ê ji we re tên, negihêjin destê we, dikare di pêvajoya penaberiyê de bibe sedema aloziyan. Jiber vê yekê divê û hûn her sibeh sax bikin ka bê ji bo we name hatiye, an na. Eger li wargeha we panoyeke(lewheyeke) ji bo nameyên hatine hebe, ji kerema xwe rojane li wê panoyê binêrin. Wekî din ji wî kesî/wê kesa ku li wargeha we nameyan belav dike bipirsin.

- Eger hûn bar bikin deverekê, an jî we bişînin wargeheke dinê, navnîşana xwe ya nû yekser ji BAMF-ê re bişînin û wê jê agahdar bikin. Ku sazî û dezgehên dinê ên fermî navnîşana we ya nû zanibin jî, li ser we ferz e ku hûn (BAMF-ê) ji vê yekê agahdar bikin. Herweha ku parêzerê an parêzera we hebe, wan jî yekser ji vê yekê agahdar bikin.

Di pêvajoya penaberiyê de li çi tê pirsîn?

BAMF di pêvajoya penaberiyê de li bersîva van pirsan digere:

- **Gelo ji bo pêvajoya penaberiyê Almanya berpirs e an welatekî din?** Hûnê agahiyên di vê derbarê de di qutîkê de bibînin.
- Ku Almanya ji bo pêvajoya penaberiyê berpirs be, wê bê pirsîn bê: **Li welatê we di derheqê we de lêpirsînek, şopandinek (taqîbatek) heye û eger hûn vegerin welatê xwe, wê çi bê serê we ?**

Dibe neyê fêmkirin ku ji kesên li mafê penaberiyê digerin, car caran di yek hevpeyvînê de û car caran jî di hevpeyvînên cuda de, pirs têne kirin. Ferz e ku BAMF di destpêka her hevdîtinê de we di derbarê hevpeyvînê de agahdar bike, bê mebseta hevpeyvînê çi ye.

Li gorî »Dublinverfahren«-ê tesbîtkirina berpirsiyariyê

Almanya jî di nav wan de, gelek dewletên Ewropayê li serê lihev kirine ku divê her tenê yek ji wan ji bo meşandina serlêdaneke penaberiyê berpirs be. Ji bo vê yekê jî van dewletan li paytexta Îralandayê, Dublin-ê peymanek bi hev re îmze kirine. Lewma jî pêvajoya ku welatê berpirs tê tesbîtkirin, weke pêvajoya Dublinê ‘’Dublinverfahren” hatiye binavkirin.

Di »Dublinverfahren« de dikare derê holê ku divê pêvajoya serlêdana we ya penaberiyê ne li Almanyayê, lê li welatekî din yê Ewropayê bê meşandin. Ev yek beriya her tiştî di van şert û mercan de çêdibe:

- Ku we li dewleteke dinê ya Ewropayê serî li mafê penaberiyê dabe,
- Ku li dewleteke dinê ya Ewropayê qeyda we ji aliyê daîreyên fermî hatibe çêkirin,
- Ku hûn bi vîzeya dewleteke dinê ya Ewropayê hatibin, an jî
- Ku delîl û diyarde hebin ku hûn li dewleteke dinê ya Erropayê mane.

Di rewşeke weha de çi dibe bila bibe, divê hûn bi nivîsgeheke şêwirmendiyê, bi parêzerê xwe an parêzera xwe re biaxivin, bê ka gelo bi rastî jî Almanya ji bo pêvajoya serlêdana we berpirs e, an na. Eger bi rastî jî rewş ev be, bêyî ku sedema serlêdana we ya ji bo mafê penaberiyê bê nirxandin, dikare dawî li pêvajoya serlêdana we ya li Almanyayê bê. Lê ev nayê wê wateyê ku hûn êdî li Ewropayê nikarin mafê penaberiyê bidest bixin.Tiştê ji we tê xwestin ev e ku hûn ji dewleta ji bo serlêdana we berpirs e, daxwaz bikin ku di derheq we de biryar bide. Hûn dikarin li wê jî bêne parastin.

Li ser BAMF-ê ferz e ku we di derbarê »Dublinverfahren«-ê de agahdar bike. Divê BAMF di vê derbarê de agahiyên nivîskî bide we.Wekî dinê, divê di **hevpeyvîneke** derheqê ‘’Dublinverfahren”-ê de pêk were, bê zelalkirin, bê »Dublinverfahren«-çi ye. Ev hevpeyvîn dikare bi hevdîtina bo wergirtina îfadeya we ve ya ku hûn dê tê de sedemên serlêdana xwe bibêjin jî bê girêdan. Lê dibe ku ji hevdîtina îfadewergirtinê cuda jî pêk bê. Eger sedemên we yên taybet hebin ku divê serlêdana we ya mafê penaberiyê li Almanyayê bê ne li dewleteke dinê ya Ewropayê bê dîtin, divê hûn wan sedeman di vê hevpeyvînê de bibêjin. Weke mînak, eger ji malbata we hin kes li Almanyayê hebin, an jî ku hûn li welatekî dinê yê Ewropayê ji binpêkirina mafên mirovan ditirsin, teqez divê hûn van tiştan di vê hevpeyvînê de bibêjin.

Eger li dewleteke dinê ya Ewropayê derbarê serlêdaneke we ya ji bo mafê penaberiyê biryar hatibe dayin, asayî ye ku dê ji bo we pêvajoyeke mafê penaberiyê li Almanyayê neyê meşandin. Lêbelê îstisna hene, lewma jî divê hûn teqez bi parêzerekê, an parêzerekî, an jî bi nivîsgeheke şêwirmendiyê re biaxivin.

Di pêvajoya serlêdanê li çi tê vekolîn?

Ku pêvajoya penaberiyê li Almanyayê bê meşandin, pirsa sereke ev e, ka gelo hûn dê weke penaber (**Flüchtling**) bêne qebûlkirin. A diyarker ev e, bê di vegera we ya welatê hûn jê hatine, metirsiya lêpirsînekê weke tehdîd li pêşiya we heye, an na. Ev merc tê wateya rewşeke ku jiyana we li wê dê di bin tehdîdê de be, an jî tehdîda ku hûn dê bêne birîndarkirin, an jî cezayekî azadiya we ji we bistîne li pêşiya we, heye. Lêbelê eger bandorên wan ên xirab hebin, binpêkirina mafên mirovan yên dinê jî dikarin bên wateya şopandinekê. Wekî din jî tê lêpirsîn, bê gelo ji sedema taybetmendiyeke we, dibe ku mafên we ên mirovî bêne binpêkirin. Ev dikare taybetmendiyên mirovekî/mirovekê (rengê çermê we, zayenda-cinsiyet-, tercîha we ya cinsî) an jî baweriyên siyasî û olî bin.

Ku xeteriya şopandinê neyê dîtin, vekolîna pêvajoya penaberiyê hê jî bidawî nebûye. Divê BAMF herweha lê bipirse, bê gelo li welatê we xeteriyên dinê weke tehdît li pêşiya we hene, an na.Weke mînak, eger li welatê we ji sedema şerekî navxwe xeterî weke tehdîd li pêşiya we bin, dikare statûya »**subsidiärer Schutz**« ji bo kesê/kesa ku bi taybet tehdîda zirareke mezin li ser hebe, bê dayîn.

Wekî din jî tê vekolîn, bê gelo tehdîdên talûkeyên dinê yên giran li pêşiya we hene, an na. Yek ji van rewşan dikare ev rewşa destnîşankirî be; Eger hûn ji sedema nexweşiyekê an jî jiber zehmetiyên şert û mercên taybet yên jiyanê, nikaribin li welatê xwe jiyana xwe bidomînin û bijîn. Ku rewş ev be, ferz e ku BAMF »Abschiebungsverbot« biryara qedexeya paşveşandinê werbigre.

Pirsa, bê gelo beriya hatina we ya Almanyayê derfet hebû ku hûn li devereke dinê bêne parastin, her dem girîng e. Ev dever dikare dewleteke dinê, an jî devereke dinê li welatê we be. Eger rayedarên alman biryar bidin ku hûn dikarin li devereke dinê bêne parastin û hûn dikarin vegerin wê deverê, dikare ji bo we li Almanyayê parastin bê redkirin.

Vexwandina ji bo îfadeyê

Ji bo serkevtin an neserkevtina serlêdana we ya mafê penaberiyê, îfadeya we diyarker e. Eger we berê li gel daîreyeke dinê (weke mînak li gel polîs) an jî we di dema qeyda xwe ya li wargeha qebûlê (Aufnahmeeinrichtung), sedemên derketina xwe ya ji welêt binav kiribin jî dîsa jî ya diyarker îfadeya we ya li gel BAMF-ê ye.

Dibe ku çend saet an jî çend roj piştî serlêdana we ya ji bo mafê penaberiyê, îfadeya we bê wergirtin. Lêbelê dibe heta ji bo îfadewergirtina we rojek were destnîşankirin, bi mehan jî bajo. Li hin nivîsgehên BAMF-ê kesên ji hin welatan, ji ber ku BAMF di wê baweriyêde ye ku şansê qebûla kesên ji van welatan tên, an gelek baş, an jî gelek xirab e, zûtir îfadeya wan tê wergirtin. Bi vê yekê BAMF hêvî dike ku dê bikaribe derbarê serlêdana kesên ji van welatan bilez biryar bide. Lê bilez an jî biderengî wergirtina îfadeya we, ji bo şansê qebûlkirin an neqebûlkirina serlêdana we nayê ti wateyê. Dibe ku ji sedema kar û barên BAMF-ê zêde ye û gelek serlêdan li benda biryarê ne jî pêvajoya serlêdanekê dirêj bajo. Çi dibe bila bibe, BAMF mecbûr e sedemên we yên ku we di dema îfadeyê de binav kirine, binirxîne. Nabe ku ji sedema hûn bi taybet ji welatekî hatine, serlêdana we neyê qebûlkirin.

Ji bilî vê dibe ku BAMF moleteke (Termin) dinê bide we ku ji we bê pirsîn bê gelo hûn li welatekî dinê yê Ewropayê mane, an na. Di vê vekolînê de armanc ev e bê gelo dibe ku welatekî dinê, yê Ewropayê ji bo meşandina serlêdana we ya mafê penaberiyê berpirs be. Ev molet di çarçoveya peymana »**Dublinverfahren**« de ye. (Agahiyên di vê derbarê de di qutîka rûpela 3.de ne)

Ku serlêdana we ya mafê penaberiyê ji sedema peymana Dublinê (Dublinverfahren) pêşwext nehatibe redkirin, hûn dê bi şêweyeke nivîskî û li gorî qanûna penaberiyê xala 25.ê (**Anhörung gemäß § 25 Asylgesetz**) ji bo îfadeyê werin vexwendin. Eger hûn ji sedema nexweşiyekê nikaribin roja hatiye destnîşankirin biçin îfadeyê, ji kerema xwe yekser BAMF-ê ji vê yekê agahdar bikin û rapora doktor pêşkêş bikin. Carina dibe ku vexwandina ji bo îfadeyê bi derengî bikeve destê kesê vexwandî, ku nema dikare di wexte de xwe bighîne cîhê moletê, an jî wext di ser moletê re derbas dibe. Di rewşeke weha de, divê hûn yekser BAMF-ê ji rewşê agahdar bikin û bi nivîsgeheke şêwirmendiyê, an bi parêzerekê/parêzerekî re biaxivin. Eger sedema neçûna we ya îfadeyê ya di roja destnîşankirî de, ne hûn bi xwe bin, pêwîst e BAMF ji bo we rojeke nû destnîşan bike.

Di dema îfadeyê de dê karmendekî (mamûrekî) an jî karmendeke BAMF-ê bi xwe li sedema derketina we, ya ji welêt bipirse. Îfade derfeta herî girîng e ku hûn tê de sedemên serlêdana xwe ya bo mafê penaberiyê bibêjin. Hîç nabe ku hûn roja destnîşankirî neçin. Û divê hûn xwe ji bo vê rojê baş amade bikin. Di dem û wextê destnîşankirî de li cîhê îfadeya we, dê li bê girtin, amade bin. Dibe ku heta îfadeya we dest pê bike, hûn hê demeke dirêj bisekinin. Ji bo rewşeke weha divê hûn hinek xwarin û vexwarin bi xwe re bibin.

Agahiyên ji bo îfadeyê

Hewl bidin ku hûn beriya îfadeyê hemû tiştên girîng ku hûn dixwazin wan bibêjin, bi bîra xwe bînin. Hûn dikarin agahî û bûyerên girîng beriya çûna îfadeyê ji xwe re binivîsin. Ev yek alîkariya we dike ku hûn bibîranînên xwe ji hev veqetînin û nezelaliyên mimkin, bibînin. Lê divê hûn van tiştên we nivîsandiye bi xwe re nebin îfadeyê û wan nedin BAMF-ê. Dibe ku mirov weha bifikire ku hûn çîrokeke berê hatiye nivîsandin ji wan re dibêjin. Xwe ji bo vê yekê jî amade bikin ku divê hûn behsa bûyerên hûn bi wan êşiyane û ji bo we bar in jî bikin.

Eger hûn weke jinekê nikaribin bi mêrekî re derheq tiştên hatine serê we biaxivin, vê yekê heta mimkin be zû ji BAMF-ê re bibêjin. Karmendên BAMF-ê yên bi taybet ji bo îfadewergirtina jinan hatine perwerdekirin, hene. Karmendên bi taybet ji bo kesên temenê wan biçûk û kesên ji sedema bûyerên xirab di bin nîrê nexweşiyên giyanî de ne, hatine perwerdekirin jî hene. Herweha eger hûn ji sedema tercîha xwe ya cinsî di bin zextê de bin, hûn dikarin ji aliyên karmendên bi taybet ji bo vê yekê hatine perwerdekirin, bêne guhdarîkirin. Ji kerema xwe di destpêkê de BAMF-ê agahdar bikin ku hûn dixwazin bi keseke/kesekî bi taybet hatiye perwerdekirin re biaxivin.

Di dema îfadewergirtinê de **wergerek**/tercumanek jî amade ye. Heta mimkin be zû ji BAMF-ê re bibêjin bê hûn dixwazin di îfadeyê de bi kîjan zimanî biaxivin. Ev ziman divê ew zimanê ku hûn bikaribin herî baş derdê xwe pê bibêjin, be. Herweha ku hûn bixwazin wergera we jinek be, hûn dikarin vê daxwaza xwe ji BAMF-ê re berê bibêjin.

Mafê we heye ku hûn li gel wergerê/wergera BAMF-ê, hûn keseke/kesekî bi zimanê we û zimanê Almanî baş dizane destnîşan bikin û bi xwe re bibin îfadeyê. Ev kes nikare bi xwe wergerê bike, lê dikare binêre bê werger rast tê çêkirin, an na û dikare ji bo hevfêmkirinê bibe alîkar. Keseke/kesekî

weha bi xwe re bibin ku hûn li gel wê/wî jî bikaribin li ser her tiştî bi rihetî biaxivin. Ev kesa/kesê hûn bi xwe re dibin tenê dikare di dema wergerê de bibe alîkar, ew bi ti awayî nikare ji dêvla we sedemên we yên penaberiyê bibêje û li ser navê we biaxive.

Li serê ferz e ku werger agahiyên hûn dibêjin rast û bi bi berferehî wergerîne. Erka werger tenê ev e ku tiştên hûn dibêjin û pirsên ku karmenda/karmendê BAMF-ê ji we dipirse, wergerîne. Ew nikare tiştên hûn dibêjin şîrove bike. Eger hûn ferq bikin ku werger şuxlê xwe nake, bala kermenda/karmendê BAMF-ê bikşînin. Eger we dît ku hûn û werger ji hev baş fêm nakin, daxwaz bikin ku îfadeya we bi wergereke/wergerekî dinê dom bike. Israr bikin ku ev rexneya we di protokolê de bê nivîsandin.

Eger derbarê zext û şopandina we **belge û delîlên nivîskî** hebin, herî dereng wan di dema îfadewergirtina xwe de pêşkêş bikin. Ev dikarin belgeyên weke (nivîs û nameyên daîreyên fermî, belgeyên partiyan, cemaetên olî û weke wan bin), an jî ragihandinên rojnameyan yên derbarê bûyereke ku hûn jî bûne goriyê wê, bin. BAMF belgeyên weha dixe dosyeya we. Ji BAMF-ê daxwaz bikin ku kopiyeke belgeyên we ew teslîmî wan kirine, bide we. Eger hûn di wê baweriyê de ne ku heval an xizmên/mirovên we dikarin ji welêt belgeyên girîng bişînin, vê yekê ji BAMF-ê re bibêjin. Belge dikarin weke delîl pir bikêr bên. Lê yên diyarker ev tişt in ku hûn wan di îfadeya xwe de dibêjin. Di hîç şert û mercî de belgeyên sexte/nerast pêkêş nekin. Eger sextekariya wan derket holê, ev yek dikare bibe sedem ku hemû tiştên we gotine, weke tiştên bawerî bi wan nabe, bêne nirxandin.

Eger di destê we de belge hebin ku îsbat dikin hûn bi balafirê hatine Almanyayê (Weke mînak;Karta balafirê, karta firê-Boarding Card), divê hûn wan radestî BAMF-ê bikin.

Eger we parêzerek girtibe, ev parêzer dikare li gel we beşdarî îfadewergirtina we bibe. Herweha mafê we heye ku **kesek hûn pê bawer in** bikaribe weke **kesa/kesê alîkar** beşdarî îfadewergirtina we bibe. Di vir de a herî baş ev e ku hûn şêwerimendekê an jî şêwirmendekî qanûnên penaberiyê qenc nas dike û bi we re amadekariyên ji bo

îfadeyê kiribe, peyda bikin. Ne asayî ye ku hûn kesek ji malbata xwe û bi xwe serlêdana mafê penaberiyê kiribe, weke kesa/kesê hûn bawerî pê tînin, hilbijêrin. Ku kesek hûn pê bawer in, dê beşdarî îfadewergirtina we bibe, divê hûn heta mimkin be zû BAMF-ê ji vê yekê agahdar bikin. Kesek weha, tenê di rewşa ku hûn dê bikarbin ji ber xwe ve her tiştekî xwe bibêjin, tevî vî şuxlî bikin. Kesê hûn pê bawer in nikare ji dêvla we sedema serlêdana we bibêje, lêbelê ew dikare hay jê hebe ku hûn tiştekî girîng jibîr nekin.

Birêçûna îfadeyê

Pirê caran îfade bi gelek pirsên li pê hev dest pê dike. Li vir pirsên derheq pêwendiyên we yên şexsî, weke mînak; Pirsên derheqê hevjîna-hevjînê(jin-mêr) we, zarokên we, dê û bavê we, kar û şuxlên we, û herweha yên derbarê hatina we ya vir, tên pirsîn. Eger ev pirs berê ji we hatibin pirsîn, karmenda/karmendê BAMF-ê bi kurtayî li ser wan radiweste. Di van pirsan de ji we tê xwestin ku hûn rasterast û kurt bersîv bidin.

Li himberî vê, di dema pirsên derbarê sedema derketina we ya ji welatê we ji we bêne pirsîn, divê hûn bi berfirehî biaxivin. Li vir ji we tê xwestin ku hûn jiber xwe ve sedemên bi cîh hiştina welatê xwe bibêjin û wan tarîf bikin. Bi qasî hûn pêwîst bibînin, wext ji bo vê yekê veqetînin. **Bi tarîfkirineke berfireh û tam**, hûn şansê xwe zêde dikin ku karmenda/karmendê BAMF-ê bi we bawer bike. Bibêjin bê dema hûn vegerin welatê xwe, hûn ji çi ditirsin. Behsa rewşa siyasî ya gelemperî li welatê xwe nekin. Tenê ku ji we bê pirsîn li serê biaxivin.

Bi gotinên weke; (astengiyên malbata min li gel polîs hebûn) bûyeran paşguh nekin, berevajî zelal tarîf bikin bê çi hatiye serê we. Weke alîkariyê hûn dikarin van pirsan bikar bînin:

- »Çi qewimî û çewa bidawî bû ?«
- »Kengî û li ku qewimî ?«
- »Kî li wê bû ?«
- »Çima qewimî ?«

Herçi tarîfeke temam girîng be jî, ev nayê wê wateyê ku divê hûn hemû teferuatan bibîra xwe bînin, an jî bersîvên hemû pirsan yekser jiber xwe ve bidin. Weke mînak: Ev asayî ye ku hûn nikaribin dema bûyereke ku gelek wext di ser re derbas bûye, tam bibîra xwe bînin. Di rewşeke wisa de ne pêwîst e ku hûn demê texmînî bibêjin an jî demekê ji ber xwe ve bibêjin. Ev dikare di îfadeya we de bibe sedema nakokiyan. Bibêjin ku dem tam nayê bîra we û hewl bidin bi saya agahiyên dinê demê bisînor bikin. (Weke mînak: Du hefte piştî rojçêbûna bavê min, an jî Jiber cil û bergên qalind li min bûn, divê zivistan be.)

Carinan di nav kesên li mafê penaberiyê digerin "Çîrokên" ku xwedêgiravî bi wan serlêdana mirov ji aliyê BAMF-ê tê qebûlkirin, belav dibin. Di hîç şert û mercî de rê nedin ku tiştên weha tesîrê li we bikin. Karmendên BAMF-ê rewşa li welatê we dizanin û yekser fêm dikin ku çîrokeke şaş ji wan re tê gotin. Dibe ku paşê ji agahiyên we yên rast jî bawer nekin.

Dibe hin bûyer hebin ku hûn nikaribin bi kesek biyanî re li ser wan biaxivin. Lêbelê divê hûn van bûyeran negotî nehêlin, berevajî behsa wan bikin, bê ev bûyer kengî û li ku qewimîne û çima hûn nikarin bi teferuat wan tarîf bikin.

Dibe ku karmenda/karmendê BAMF-ê derheqê yeko yeko xalan de pirsên dûmahîk ji we bike. Divê hûn hewl nedin pirsa hema bi şêweyeke kurt bibersivînin, bervajî eger ji we nehatibe pirsîn jî,

divê hûn hemû tiştên girîng bibêjin. Werhasil bersîvên xwe her piştî we pirs baş fêm kir, bidin. Ku we pirs fêm nekiribe, daxwaza bo ronîkirina pirsê, bikin.

Eger nexweşiyeke we hebe û hûn pê diêşin, divê hûn ji BAMF-ê re behsa wê bikin. Beriya her tiştî ku hûn ji dewletekê tên û li wê xizmetên tenduristiyê ne weha baş in an jî hûn dê nikaribin mesrefên dermankirina nexweşiya xwe li welatê hûn jê tên bi xwe bidin, ev yek girîng e, divê hûn vê yekê bibêjin.

Bila wextê we fireh be. Rê nedin ku ji we bê xwestin, da ku hûn her tiştî bi lez bêjin. Di rewşên acil de îfadewergirtin dikare bê rawestandin û dikare piştî bêhndaneke an jî rojeke dinê dîsa bê domandin.

Protokol

Agahiyên we di protokolekê de têne berhevkirin. Ji bo vê yekê karmenda/karmendê BAMF-ê di dema îfadewergirtinê de protokolê bideng qeyd dike, da ku piştre bê nivîsandin. Li vir her tiştê ku di îfadeyê de hatiye gotin, gotin bi gotin nayê nivîsandin. Jê dêvla vê, karmenda/karmendê BAMF-ê tiştên hatine gotin bi kurtayî dinivîse. Dibê ku di protokolê de şaşî hebin. Lêwma jî divê hûn kontrol bikin, bê her tişt rast û bi temamî hatiye protokolekirin. Eger hûn bixwazin, divê protokol gotin bi gotin ji we re bê wergerandin. Hûn dikarin beriya îfadewergirtinê, zelal bikin ku hûn dixwazin protokol ji bo we bê wergerandin. Gelek caran tê pirsîn bê hûn ji vî mafê wergerandina protokolê dibihurin. Lê divê hûn vî mafê xwe bikar bînin. Eger hûn şaşî û an şaşfêmkirinan bibînin, wan bidin rastkirin. Protokola îfadeya we, girîngtirîn belgeya pêvajoya daxwaza penaberiyê ye. Dibe ku kesek din ku qet bi we re neaxivî be û tenê protokolê dinase, li ser serlêdana we biryar bide.



Dawiya dawî, dê ji we were xwestin ku hûn protokolê îmze bikin. Hûn bi îmzeya xwe misoger dikin ku we dikaribû hemû agahiyên girîng bibêje, ku we hemû tişt fêm kirine û protokol ji bo we hatiye wergerandin. Eger ev tişt ne weha be û şaşî di protokolê de hebin, îmze nekin. Di rewşeke weha de hema piştî îfadeyê bi nivîsgeheke şêwirmendiyê, parêzgerekê an jî parêzgerekî re biaxivin.

Daxwaz bikin ku nusxeyeke(kopiyek) protokolê beriya biryar were wergirtin, bidin destê we. Weke ku adet e, nusxeya îfadeya we piştî çend hefteya bi potsê (berîd) ji we re tê şandin. Bi alîkariya kesek ku bikaribe naveroka protokolê ji we re wergerîne lê binêrin bê di protokolê de çi hatiye nivîsandin. Bal bidin, bê her tişt bi temamî û bi awayeke rast hatiye nivîsandin. Eger parêzera/parêzerê we hebe, protokol dê têkeve destê wê/wî û ew dê an ji we re bişîne, an jî li serê bi we re biaxive. Heger

na, ji nivîsgeheke şêwirmendiyê alîkariyê bixwazin da ku hûn bikaribin şaşiyan li gel BAMF-ê bidin rastkirin.

Biryara BAMF-ê

Biryara (»**Bescheid**«) BAMF-ê ya derbarê serlêdana we ya mafê penaberiyê, dê nivîskî ji we re were rêkirin. Jiber vê yekê jî divê hûn her roj sax bikin bê ji bo we name hatiye, an na. Eger li wargeha we lewheyeke ji bo nameyên hatine li serê têne nivîsandin an daleqandin hebe, ji kerema xwe rojane lê wê lewheyê binêrin. Wekî din ji wî kesê/wê kesa ku li wargeha we nameyan belav dike bipirsin. Eger parêzereka/parêzerekî we hebe, dibe ku biryar (Bescheid) ji nivîsgeha parêzer re jî bê şandin. Jiber vê yekê weha bikin ku parêzera/parêzerê we her dem bikaribe xwe bighîne we.

Ku serlêdana we ya mafê penaberiyê bê redkirin, mafê we heye ku hûn li gel dadgehekê(mahkemê), xwe li himberî vê biryarê biparêzin. Lê bo vê yekê wextê we teng e. Bala xwe bidinê bê di rûpela yekê ya Bescheid-a we de çi dinivîse:

- Heke di rûpela yekê de " serlêdana ji bo statûya penaberiyê tê redkirin« (»**abgelehnt**«) hatibe nivîsandin li gorî adetê du hefte wextê we heye ku hûn nerazîbûna xwe ragihînin dadgehê. Ev yek ji bo statûya »**subsidiärer Schutz**« ji bo we hatibe naskirin jî weha ye, lêbelê ku hûn bixwazin weke penaber bêne naskirin- divê hûn serî li dadgehekê bidin-.

- Ku di rûpela yekê de: »Serlêdana ji bo statuya penaberiyê eşkere ji bêdelîliyê tê redkirin« (»**als offensichtlich unbegründet abgelehnt**«) hatibe nivîsandin, ji bo hûn bikaribin serî li dadgehê bidin wextê we tenê hefteyek e.

- Ku di rûpela yekê de: »Serlêdana ji bo statuya penaberiyê weke ku serlêdana ne dicîh de hatiye redkirin« (»**als unzulässig abgelehnt**«) hatibe nivîsanin, BAMF-ê biryar daye ku ne pêwsît e pêvajoya penaberiyê li Almanyayê bê meşandin, weke mînak: Jiber dewleteke dinê ji bo serlêdana we berpirs be. Di rewşeke weha de jî wextê we tenê hefteyek e.

Di her halî de divê bê lêpirsîn, bê ti fêde û wateya serlêdana dadgehê heye, an na. Jiber vê yekê divê hûn yekser û a herî baş hê roja biryar (Bescheid) kete destê we, serî li parêzerekê/parêzerekî an jî nivîsgeheke şêwirmendiyê bidin.



Weitere Informationen **Further information** **Autres informations**